Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weğanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar (79) Nîsan 2008 z-2620 k Buha (15) ps

Li Qamişlo şeva Newroza 2008-an

Li hinde kolanên taxa Rojava li bajarê Qamişlo roja 20 ê Avdarê li dora kat 6:30 ê êvarî , bi sedan xortên Kurd li hev civiya bûn , li ber agir û mûman bi aştiyane û dilên şa govend û dîlan digerandin . Yekcar , ne di bîr û xeyala wî xelkî de bû, ku weha ji nedîve agir bi ser wan de bibare û şahiya wan bibe şîn û girî .

Bi destên hêzên karbidesta dewletê , **sê** xortên camêr têne kuştin , dibine qurban û şehîdên Newroza xwe û dora dehan jî birîndar dibin . Yên birînkûr digihên nexweşxanan û yên ku, birînên wan sivik li malan û di nêv hev de dihatin dermankirin . Tevî ku birînên hemiyan ên qurşînên zindî bûn. Û tê gotin ku ne tenê yên zindî bûn , lê belê yên domdom bûn jî .

Ev bûyera he , ya kirêt û hovane , derhal bi telîfonan li seranserî herêman li nav Kurdan dihate belavkirin û dibû ciyê xemgîniyê .

Bi dawiya wê şevê re , berpirsiyarên rêxistinên Tevgera Kurd a Sûrî karîbûn li hev bikin , bi helwesteke hevpar daxuyaniyeke siyasî ji raya giştî re bidine belavkirin , û tê de vê kiryara hovane şermezar bikin û ji xelkê Kurd bixwazin ku, şahiyên Newrozê li Sûriyê û li derve bêne rawestan û şînê bikşînin bi hawê nederketin û reşgirêdanê .

Belê , bi xemgînî û melûlî xelkê Newroza îsal derbaskiribû . Lê, bi sedan rêxistin û hêzên siyasî , mirovhez û mafparêz , dengên xwe bilindkirin û gotin **Na** ji vê ton kiryarê re li dij Kurdan li Sûriyê , û karbidestên berpirsiyar dihatin rûreşkirin . Ji bilî gelek qenalên Tilifizyon û malperên Entirnêtê ku, dihêştin nav û dengê hebûna pirsa Kurd li Sûriyê bi xurtî bête bihîstin û piştgirî pê re riya xwe bibîne .

Rastiya pirsê ew e ku , diltengî û çavsoriya desthilatiya rijîma Be'is li beramber cejna Newrozê her diçe bêtir dibe , tirseke mezin dikeve zikê wan karbidestan . Lewre jî , bi her hawayên diyar û nediyar dikin û dixebitin ku , ev cejna Kurdan ya salane bête herimandin , bibe cî û sedema şîn û xemgîniyê , şahî ji holê rabe , dengê mûzîk û strana kurdî nekeve guhan , xelk li ser hev kom nebe û necive , destan nedin hev û Newroza hev pîroz nekin.

Sînorê Yekta